

Ji bo tevahiya Dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê

Berlin, 22.12.2021

Agahiya ji bo dêûbavan

Dêûbavên hêja,

Korona hêj jî rewşa rojane ya hêlîna zarokan diyar dike. Cûreya Omikron dê di destpêka 2022an de bibe sedema gelek enfeksiyonan.

Derzîlxwedana kesên temen-mezin dê bibe alîkar. Her wisa derziya 3. jî li xwe bidin!

Wekî din, zarokên 5 salî jî niha dikarin derzî li xwe bidin.

Ji bo hêlînên zarokan pişfî meha Çileyê ev yek derbas dibin:

- Peywira Testê ji bo tevahiya zarok û xebatkaran di rojên lênêrînê yên 1 û ya de.
- Li gofî derfetê, komên neguherbar û sabîf.
- Di dema anîn û birinê de rê li ber pêwendiyê bigirin. Bi qasî ku pêkan e, divê zarok li pêşiya hêlînê werin radestkirin.
- Li gofî paqijiyê tevbigerin! Maske bi kar bînin!

Li hêlînê teqez rê li ber civînên li gel dêûbavan û şevên dêûbavan bigirin.

Telefon û Zoomê bi kar bînin.

Gava karanfina hebe:

- Hêlîna zarokan dikare bi giştî yan jî bi qismî were girtin.
- Demên vekirî dikarin kurttir bin.

Derziya ji bo zarokên ji 5 salî mezintir li van deran pêkan e:

- Doktorê zarokan
- Navenda Derzîlêdanê
- Derzîlêdana li dibistanê (serê navçeyê dibistaneke seretayî)

Qeydî pêwîst e:

- Bi riya telefonê li ser (030) 9028-2200
- online bi riya Doctolib: <https://www.doctolib.de/institut/berlin/ciz-berlin-berlin?pid=practice-158436>

Testkirina zarokên hêlînan

Peywira testê di her du rojên pêşî yên lînêrîna zarokan de!
Ji kerema xwe re hûn paşê bi rêkûpêk zarokên xwe test bikin.

Zarokên zekemîkefî

Dibe ku zehmet be, ku zarok li navenda testê yan jî li ba doktorê zarokan werin testkirin. Hingê pêkan e, ku test li hêlîna zarokan di bin çavdêriyê de were kirin. Bifikirin: Zarokê/a we herî xweş li malê baş dibe!

Gava zarokê/a we demeke dirêj li malê bimîne:

Divê hêlîna zarokan di derbarê nehatina demeke dirêj a bê lêborîn de (piştî 7 hefteyan) agahî bide Saziya Ciwanan (Jugendamt). Saziya Ciwanan dikare paşê serlêdaneke nû bixwaze.

Hinek dêûbav ji ber parastina malbatê zarokê/a xwe niha naynin hêlînê. Divê hûn vê yekê ji hêlîna zarokan re bibêjin.

Ji ber rewşa taybet em vê yekê sabît dikin:

Hesabkirina 7 hefteyên dema nehatinê di 15.01.2022an de dest pê dike. Hêj piştî 04.03.2022an divê hêlîn nehatina zarokan ragihîne.

Dêûbavên hêja,

ev sal gelek zehmet bû. Bi hev re em dikaribûn bihêlin, ku kreş ji bo zarokan vekirî bimînin. Ev yek her wisa di sala pêş de jî armanca me ye.

Gelek spas ji bo piştgiriya we! Em hêvî dikin, ku hûn di rojên betlaneyê de bêhna xwe vedin û sala we ya nû xweş û bi tendursîfî be.

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk